

Perwerdeyeke baş ya ji bo şagirtên nûhatî berpîrsîyarîyek tevahîya dibistanê ye

Lêkolîn nîşan dide:

- Dibistan perwerdeyê di asteke têr bilind de li gorî pêdivî û şertên şagirtên nûhatî pîlan nakin, pêk naynin û li hev naynin.
- Di ware pêşxistina bawerîya şagirtên nûhatî yê bi karîna kapasîteya xwe de, motîvasyon û tesîrkirinê de dibistanan di dereceyeke nizim de performans nîşan dane.

Pêşdarîkirineke sîstematîk ya baştir û stratejîyên hevbeş

Şagirtên nûhatî di asteke bilind de perwerdeyek têra xwe teşwîqkar, pêşbirkexwaz û li gorî kesê hatîye pîlankirin nabînin.

Dema dest bi dibistana swêdî dikin li cem şagirtên nûhatî di ware wan dersên cûda yê dibistanê de tecrûbe û astên cûda yê zanebûnê hene. Hîn ji dibistanan ji bo zanibin ka dereca zanebûna şagirtan çiqasî ye hîn nêzîkbûnên baş nîşan didin. Lê tu dibistanek têra xwe pêşdarîkirineke sîstematîk pêk nayne. Dema pêşîn ya li dibistanê ji bo hînbûna zimanê swêdî tê bikaranîn û ji bo dersên din kêmtir wext tê serfêkirin. Lêkolîn nîşan jî dide ku pêşengîya dersan ya bi zimanê dayîkê (li cihên ku ev pêk tê) û alîkarîya taybetî bi sere xwe dimeşe û bi perwerdeya din ya gîştî re nayê koordînekirin.

Kalîteya perwerdeyê girêdayî mealdana mamosteyên takekes e. Piraniyeke mezin ya wan dibistanên li ser wan lêkolîn hatîye kirin bi awayeke gîştî nêzîkê pîrsê nabin û ev dibistan ne xwedî rêxistin û sîstmek wisa ne ku derfet û destekê bidin mamosteyan ku ew perwerdeyeke baş bidin şagirtên nûhatî.

ji bo perwerdeyeke baştir bidin şagirtên nûhatî gerek e dibistan van tiştan bikin:

Di kêlîyeke mêj de pêşdarîyeke sîstematîk ya rêkûpêk li ser tecrûbe û zanebûnên şagirtan amade bikin.

Perwerdeyê li gorî wê pêşdarîya sîstematîk ya ku hatîye amadekirin sererast bikin.

Pêşengîya perwerdeyê ya bi zimanê dayîkê, ya ku pêdivî pê heye, bidin şagirtên nûhatî.

Stratejîyên hevbeş amade bikin. Hinbûna ziman di hemû dersan de pêk tê. Ji bo vê yekê pêwîst e hemû mamoste mamosteyên ziman bin.